## Roj ji Rojhelat derdikeve
»»» R:8




## Hewcehiya me bi plana B jî heye
»»» R:2

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (436) 06-12-2022 Buha (1000) Tûmen*

## Hikûmetên Ewropîyan li dijî zilma rêjîmê xwe giran digirin.
»»» R:3

## Yeldaya serhildan û hêvîdariyê
»»» R:5



# Hewcehiya me bi plana B jî heye



N: Areş Salh
Çalakvanê Siyasî

Piştî şoreşa Jînayê derkevt neteweyên bidest çawa dikarin di nav siyaseta Îranê de rol bilîzin û bibin hevênek ji bo guherîkariyan di Îranê de. Lê, tiştek din jî xuya bû ku em mîna hêza siyasî ya gelê Kurd dibe ku nirx û girîngiyê bidin bi vê yekê. Û ji bo me jî derkevt ku em mîna gelê Kurd û neteweyên bidest nikarin bi tena serê xwe bi bê amadebûna Tehranê rejîma Îranê biherifînin.

Herçend ku rêberê me yê mezin pir caran ev tişta gotibû, lê, bo me bi kiriyar û di nav emel de îspat bû ku ev gotina Dr. Qasimlo heta çi astekî rast û bi çi awayî drust e. Lê, cudahiyek din di navbera heqîqeta serdemê ku Dr. Qasimlo û vê gotina ku gotiye digel heqîqeta serdema me de heye.

Di serdemekê de ku Dr. Qasimlo ev gotina aniye ziman, arîşeya herî sereke hişyarbûna neteweyên din û bi taybet neteweya Fars bûye. Di serdema Dr. Qasimlo de tenê Kurd mîna neteweyek ev hişyariya siyasî hebûye ku bi awayek berfireh dijberiya Komara Îslamî kiriye. Neteweyên din yên Îranê di serdema Dr. Qasimlo de ne xwediyê vê helwesta siyasî bûn û ne jî xwediyê vê hişyariya siyasî ya niha. Bi zimanek din eger em bixwazin bibêjin di dehikên destpêka temenê Komara Îslamî de, rewayî a rejîma Komara Îslamî di nav neteweya serdest û piçek jî di nav neteweyên din de di asta gelek bilind de bû.

Loma, ji bo Dr. Qasimlo di vî serdemî de arîşeya sereke hişyariya siyasî ya neteweya serdest û neteweyên din yên Îranê yên mîna Tirk, Ereb û Belûç bû.


Loma, Dr. Qasimlo dixwast alîkariya hêzên Îranê ji bo zêde kirina vê hişyariyê top bike, heta nerazîbûnên xelkê li bajarên mezin bi taybet li Tehranê zêde bikin.

Lê, di serdema me de, rewatiya rejîmê bi awayekî xuya qut bûye û kevtiye kirîzeke herî mezin de. Dujiminî û berxwedanî di navbera hikûmet û tevahiya gelên Îrana îroyî de di rewşekê de ye ku, nikare paşve bizivre.

Hikûmeta îro tenê bi zora tundûtîjî, îdam û kuştinê, jiyana xwe didomîne. Lê, niha jî Tehran û bajarên mezin yên Îranê nikarin rola xwe bilîzin. Me dît ku pişta şoreşa Jînayê, di nav çend tax û kolanên Tehranê de xwenîşandan gelek girîng bûn.

Herçend ku li Tehran û bajarên mezin gelek kesan canê xwe gorî kirin û gelek kes jî hatin girtin, lê, vê xebatê nekarî weke bajarên Kurdistanê giştgîr bibe. Bi rastî wan serhildanên Tehranê nikarîbûn alingarîyek herî mezin bo hikûmetê çê bikin. Ji aliyek din ve eger em mêze bikin di rastiyê de rêjeya beşdarbûyên Tehranê nikaribû bigihîje asta herî girîng. Hîn berî vê ku li Îranê şoreş çê bibe li sala 1357`an de, ji sedî 11 heşîmeta Îranê tevlî vê şoreşê bibûn.

Di anv te`oriya şoreşê de jî dibêjin ku, ji bo serhildanê eger bixwazî serkevtina xwe misoger bikî, divê ji sedî 3 xelkê tevlî vê şoreşê bibin. Eger em mêze bikin ji sedî 3 parêzgeha Tehranê 420 Hezar kes dibe. Em naxwazin bibêjin ki rêjeya beşdarbûyan kêm bûne an bi vê rêjeya beşdarbûyan, serhildan sernakeve. Lê, em dixwazin ku têgihîştina ji bo vê serhildanê û encama vê têgihîştinek be li ser heqîqeta civakê.



Loma, ev heqîqeta ku divê em girîngiyê pê bidin eve ku, em weke gelê Kurd divê me bername û pirojeyek ji bo xwe hebe. Piştî vê serhildanê gelek ciwanên Kurd hatine kuştin û gelek jî hatine bendkirin.

Aboriya Kurdistanê gelek xirab bûye û rewşa karûkasibiya xelkê pir xirabtir bûye. bajarên Kurdistanê niha gelek sermayeya civakî û mirovî û aboriya xwe ji dest da ye. Encama vê jî, lawazbûna zêdetira civaka me ye û pitir hebûna newekheviya civakî û aboriya di navbera me û gelê serdest de ye.

Encama zêde bona vê newekheviyê eve ku, zerfiyet û hêza civaka me ji bo berxwedan û daxwazkirina mafên xwe kêmtir dibe. Loma, dibe em bi vê siyaseta xwe re pê de herin an şûndaviyekê di siyaseta xwe de bikin. Hewce ye ku em vê rastiyê bibînin ku çarenivîsa gelê Kurd di Rojhilata Navîn de girêdayî bi Îranê ye û hinek car dibe me bo çarenivîsa xwe bername û planên taybet hebin.

Sedem her tiştek be, Tehran nikare mîna Kurdistanê û pêngav bi pêngava Kurdistanê were, loma, dibe me jî planên xwe yên stiratîjîk cihgîr an ev tişta ku dibêjin plan bo hebe.

Plan hebe bo wegeriyana ser pontanseyêl û zerfiyeta xwe di Kurdistanê de.

Vê zerfiyetê berî her tiştekê, zerfiyeta leşkerî û pêşmerge ye. Riyalîsm û nûrîna riyalîstî ji me re dibêje ku, her neteweyek di vê cîhanê de dibe bi tenê û dibe bixwe alîkariya xwe bike. Piştire dîsan ji mera dibêje ku, hêza leşkerî û çekdarî stûna yekem e bo her ekterkê ku bixwaze di vê cîhana me de berjewendî û me`inewiya xwe bidest bixe.

Loma, ez li ser vê baweriyê me ku îro rojeke ku dibe em bi hizra zerfiyeta xwe bin.

Ev zerfiyrta dikare me bike bi hêzeke bandordar, hêzek ku em bo xwe pê çalakiyan encam bidin, ev jî netenê hêzek ku bi hizra vê yekê be ji bo me li holekê de ku wir bo me bilîze.

# Hikûmetên Ewropîyan li dijî zilma rêjîmê xwe giran digirin.



N: Nuran Koyuncu

Hefteya borî wezaretên karubarên dervê yên parlemana Ewropayê ji bo helwesta hikûmeta Komara Îranê ya li dijî hemwelatiyên xwe civîyan.Di derbarê tadeyên hikûmeta rejîmê ya li hemberî gel bê rawestan didomînin axivîn.

Jê pê ve pekanîna du îdaman,biryara îdama nerazitîyan nirxandin.

Hat gotin rejîm dixwaze bi îdama ve metirsiyê li ser gel bike,ew jî ne însanetî ye,rejîm mafên mirovan ên esas bin pê dike.Li gorî peymanan navdewletî nerazîtîbûn mafekî asayiye.Rejîm neheq e,sûcdar e.Ji ber vê divê li ser Komara Îslamî biryara danekirinên bi bandor bêne dayîn.Dibe ku bi vî awayî rêya tehde û kuştinan bê girtin,zilma rejîmê bisekine.Li van giftûgoyan tê fahmkirin ku armanca biryara danekirinan ku ew jî heke bê dayîn ne ruxîna komara îslamî ye,hindek bi rawestendina tehdeyan e.Parlemena Ewrupî wer xuya dike dixwaze rejîm endamên besîcê yên ku li nerazîtiyan tehde kirine,li kolanan însan kuştine an lêdan kirine siza bike.

Her çiqas Ewrupiyî vêya bixwazin jî rejîm li wan hişyariyan ciddî nagire,piştguh dike.Berowajiya vê tevdigere;nerazitiyên li kolanan xwedêgiravî besîc birîndar kirine an kuştine îdam dike.Hefteyên borî du ciwan a navên wan Mehsun Şekarî,Mecidrıza Rahneverdî bi vê ve sûcdar bûn. Rejîmê şert û mercên darizandinê bi cî ne anî;rêya hevditîna malbatên wan û hilbijartina parêzeran nedan,ango zagonên xwe jî bin pê kirin hatin îdam kirin. Bi vi hawi bi lêz tola rabûnî hildan,hildidin jî.

Li gorî sekn û helwesta Ewrupîyan dikarin bibêjin bi hêviya reformîze kirina rejîmê ne.Hikûmetên Ewrupîyan li dijî zilma rêjîmê xwe giran digirin.Heta niha xwepêşandanên nerazîtiyan ku kete meha çaran tenê li temaşe kirin.Niha bi bandora çalakiyên li seranserê dinê piçek neçar man ew gavên sivik û piçûk davêjin.Lê hê li ser biryara danekirinan jî li hev nekirine.Heta niha xeynî hişyariyan zêdetir tu tişt nekirine.
Heger li ser Hikûmeta Îslamî biryara danekirinên dîplomatîk,rênedana danûstandinê nekin,têkiliya xwe ya dîplomatîk ranewestînin Îran tu gavekê bi şûn de navêje.Dê dîsa rêbaza xwe ye zordest li ser gelê xwe û du qat jî li ser kurd û belûciyan bidomîne. Bo vê mînakek;li gorî çavkaniyên Rêxistina Mafên Mirovan ya Îranê rejîmê heta niha 469 nerazîtî kuştinê ji wan nêzî 200î kurd,li ser 130î belûcî ne.Lê dîsa jî di derheqê hejmara û welatê wande zanînên rasteqîn ne dîyar e.

Li gorî nûçeyan dê di demeke nêz de 26 kesên dinê bêne bi dar ve kirin.Tê gotin girtiyan beriya bi dar ve kirinê pê de pê de hildidin odeyên piçûk.Mollayan dixwazin ne di carekê de li gorî berteka dewletên bi hêz mînak ên Emerikiyî û Ewrupiyî,ji xwe Rusya piştgirê wan e,li gorî pêşandanên li derveyî biryara idama dide û dike.

Hege bertekên wan bi tund bin,zexteka zor li ser wan hikûm bikin dê piçekî bi şûn de vekşin, dê demekê îdaman rawestînin,ku vê gavê bertekeke giran,bi tund li holê nîn e.Heke reaksîyon an danekirin tune be careke din yek bi yek dest bi îdaman dikin.Bi her îdaman ve dixwazin metirsîyê li ser gel zêde bikin.Lê gel natirsin carêke din derdikevin li kolanan.Çav tirsandinê wekî metirsiya têkçûyîna mollayan dinirxînin.

Li yalekî din gerek li ser tora civakî gerek xwêpeşandanên li derveyî Îranê ên xwe vetanperwerên Îranê dinasin.Radigihînin ku piraniyan wan jî farsî ne û geleke jî bi hêz in,dewlemend in.Di xwepêşandanan de ti carî behsa rewşa kurdên rojhilatê,behsa li ser kurdistiyanyan,belûciyan nakin.Dibêjin dijberiyê nexin li nav me em giş Îranî ne ango faris in.Her çi be li her derê hişmendiya hemû serweran wekî hev e.Çima ku di pêşandanan de hejmara wan li gorî kurdên dîyasporayê zêde ne,dengên wan pirtir derdikeve herweha çarçoveya pêşandanan di destên wan de ye Gelek caran erîşî Kurdên bi ala rengîn ve tevî xwepêşandanan dibin wekî ya li Berlînê ku mezintirîn xwepêşandana li derveyî bû dikin.Wekî din navê keça kurd a Jînayê hilnadin deve xwe dewsa wê navê wê ye farisî a Mahsayê bi kar tînin. Dewsa dirûşma"Jin Jîyan Azadî" jî bi farisiya wê "Zen Zengedî Azadî"yê bi kar tînin.Tim nijadiya xwe derdixin li pêş.Wekî her tiştan kuştiyên kurdan jî dikin para xwe.Bi ser miriyên kurdan siyaseta xwe didomînin.Li wan wek îranî nîşan didin.
Heyfe ku dîyasporaya kurdan wekî farisan helwest negirtin û çalak nebûn.

Heyfe ku li hemberî zexta Îranê bê deng man û hê diminîn jî.Biqasî farisan ne birêkxistinî ne,ne jî çalak in.Belawela tevdigerin.Halbûkî lawaz nîn bûyan,bêhtir dengê wan derketiba him li kolanan him bi rêya medyayê li gelê Dinyayê bêhtir rewşa kurdan bizanibûyan.Dê bizanibiyan pergala dewleta îranê li hemberî kurdan jenosîdkar e.Bi her rejîmê ve li vê pergalê didomîne.Dibe ku li ser Hikûmetên Dinyayê bandor bikiran,dibe ku piştgirîyên kurdan zêdetir biba.

Rejîma mollayan ji serî heta niha bê rawestan bi her awayi bi hovane erişî mirovên nerazî û malbatên wan dike;li wan bi tehdeyan,bi gulleyan dikujin û direvînin,binçav dikin.Tecawîzê giyan,derûnî û bedenên wan dikin wekî keçeke 14 salî ya li Tehranê a navê Hadi Kaimî yê.Ew keç ji ber tecewîza bedenî canê xwe ji dest da.Rê nadin birîndar bêne pak kirin,derman kirin.Nerazîtiyan li kolanan birîndarî binçav dikin dibin li zîndanê.Gelek birîndar di hefsê de bi jê çûyina xwînê canê xwe ji dest didin.Hin kes jî wek nivîskar û hunermend Bektaş Abdîn ku ji ber nexweşîna coronayê wê rojê mir nayên tedawî kirin. Rêjîm erişan têr nabe ne tenê hedefa wan nerazîtî ne.Ki piştgirî bike li wan sûcdar dibînin,siza dikin.Mînak;Dr Îda Rostamî piştgiriyeka jin bû.Derman dibire malên nerazitiyên birîndar,ewan di malên wan de derman dikirin.Rejîm wê di mala wê de binçav dike dibe li hefsê.Bi çend roj berê wê jî di zîndanê de bi hovane dikujin.Ji pey re çavtirsiyê didin malbata wê û yên din ku mikur bikin. Piştre bi zorê û darê malbatên kuştiyan derdixîne li pêşberî camerayan û ji wan dixwaze ewan ne bi destê rejîmê bi lêdan û tehdeyan hatine kuştin,xwekuştine.Cesedên wan nadin malbatan,bê xebera wan xwe bi xwe,bi dizî bin ax dikin.Cihê bin axkirinê heger dil bikin ji malbatê re dibêjin,heger nexwazin cihê wan bê diyar dimîne. Gelek caran jî cinazeyên kuştiyan radestî malbatê dikin lê îcar jî rê nadin bi dilê xwe merasîma cenazeyan bê kirin.Tenê destûra bin axkirinê didin.

Rêjîm bi her awayî di nav metirsiya têkçûyînê de dijîn.

wek "îro hene,sibê tun in"
Bi hêviya serkeftina Kurdan.

# Silêman Keleşî: “Girevgirtinên seranserî dikarin li demeke kurt de hikûmetên wek Îranê dîktator û dijî gelî pir aliyan we felec û teslîmê xwestekê xwe bikin”.



Silêman Keleşî
Endamê Komîteya berê yê PDKÎ

Me digel Silêman Keleşî endamêberê yên Komîteya Navendî yê PDKÎ li derheq bandora girevgirtinên seranserî yên Kurdistan û Îranê hevpeyvîn pêk anî û navbirî got: “girevgirtinên seranserî dikarin li demeke kurt de hikûmetên wek Îranê dîktator û dijî gelî pir aliyan we felec û teslîmê xwestekê xwe bikin”.

Pêş evê de ku ez persivê pisên we bidim, dixwezim pir bi dil sipasiya rêveberên rojnama Agirî bikim ku hemêşe wek pêşmerge û bi kemtirîn êmkanat erkê xwe bi cî tînin. ”


**P: Kek Silman Keleşî, xelkê Îranê niha girevgirtina seranserî hêdî hêdî dikin bi kultûr, gelo ev girev çi encamên vê bo rejîmê hene?**

**B**: Girevgirtin yêkek li van şikil û şêwên geyandina narazîbûnê ye ku civak û grupên curbecur dikarin deng û daxwezên xwe bigehîne deshilatdaran. Ya rastî ew şêwe xebat û narazîbûne li welatên demokrat û pêşketî da zor bav û bi bandore. Ewa ku Îranê de jî dest pêkiriye û dixweze mezintir be, bêşik yê gelek bi bandor be. Hikumeta dîktator û dijî azadî û mafê mirov a Îranê gelek bi hêsanî û bi nav û tohmetên curbicur meş û naraziyên ser cadan tepeser bike yan jî bi navê dijî şoreş û Miharibe ....... van bigire, bikujin û heta van wek dibînin darwekin, lê, Ev nikarin bi wî awayî wê digel girevgirtiyan reftar bikin. Berhindê jî, ez bawer im girevgirtinên seranserî dikarin li demeke kurt de hikûmetên wek Îranê dîktator û dijî gelî pir aliyan we felec û teslîmê xwestekê xwe bikin. Hêvîdarim ku ev şêweyên xebatê li Îranê da pêş keve.

**P: Kek Silêman niha em dibînin ku Yekîtiya Ewropa û Amerîka her roj hin berpirsên Komara Îslamî tehrîm dikin, gelo ev berpirsên rejîmê ku ti eleqedariya wan bi karûbarên derve tuneye ev tehrîm çi astengiyekê bo rejîmê çê dike an çima ev yekîtî û Amerîka berpirsên rejîmê yên weke wezîrê derve tehrîm nakin?**

**B:** Belê ev tehrîmên han berpirsên rêjîma Îranê dikare bo rêjîmê asteng bin, berhindê ev kesane beşikin li rêjîmê, lê, pêş wê hindê de em tenê bîr li asteng bûna van tehrîma bo Komara Îslamî bikin, ev tehrîmên han pêş hemû tiştekî da nîşan dana helwêsta Yeketiya Ewropa û Amerîka ye hember rêjîma Îranê û her wisa dikare di paşerojê de jî berfireh be û bigîje asteke billindtir.
Lê, bo çi ev Yekîtî û Amîrka wezîrên derve ê Îranê tehrîm nakin? Ez dixwezim li wê beşê da bidime eyan kirin ku ne Yekîtiya Ewropa, ne Amrîka û ne jî çi Dewleteke din dixwezin zû zû bo berjewendiya xelkê Îranê yan jî yê Kurdistan Qazanc û berjewendiyê welatên xwe ber çav negre. Ev welatane bi şirovên xwe ên dûr û kûr helwêstan digrin û yan jî biryar didin, ev pêş hemu tiştekî da, rewş û zirofê rabûn û berxwedana xelkê Îranê tîne ber çavan piştire gorey siyaset û qazancê welatê xwe biryar didin, lê, renge ev biryar û helwêstên van gorî dîtina me dijberên rêjîma Îranê gelek nerim û bi bandor nebin. Lê, ez wek xwe wisa nabînim.

Ez dizanim hûn wek rêveber û xwendevanên rojnama Agirî û her wisa jî Yekîtiya Ewropa û Amerîka li hemû kesî baştir dizanin ku qerar û biryarên Komara Îslamiya Îranê kê û kêder têne danê,



lê, ev Yekîtî û Amerîka tên hindek kesên ku rêveberên piçûkê van biryarane tehrîm dikin, dibî bête gotin ku carê berjewendiyên van wê dixwaze, neku ev li hemû kesî baştir dizanin ku hikûmeta Îranê li tevahiya xwe de zilmkar û dijî mafê mirov e. Ez evê jî lê zêde bikim û bêjim ku ev tehrîm û helwêstên Yekîtiya Ewropa û Amerîka ku dijî rêjîma Îranê têne girtin, hemu yên van bo piştgîriya xelkê Îran û Kurdistanê nine, belkî beşa here zor a van semxeratî alîkariya kirina eskerî a rêjîma Îranê ye digel Rûsyayê dijî welatê Ukraynê. Her wek dizanin Îran li şerê Rûsyayê dijî Ukraynê bi eşkere piştgîriya Rûsyayê dike û alavên pêwîst dide wê. Ber hindê jî Yekîtiya Ewrûpa û Amîrka pir acizin li wî karê Îranê.

**P: Gelo Komara Îslamî lezgînî serhildêrên binçavkirî îdam dike bi nerîna we çima wiha bi lezgîn vê kiryara dijî mirovahiyê birêve dibe?**

**B:** Ev yeka bo hemû kesê eyane ku Komara Îslamiya Îranê li dirêjiya temenê xwe de qet wek şoreş û serhildana wê carê neketiye tengavî û lerizînê, raste pêş niha de jî gelek caran meşên mezin û dijberiya wê hikûmetê hebûye, lê, çi caran wek wê carê domdirêj û hemû alî û her wisa navxwe û dervey welat yek dengiyekê rûbirû nebibû. Ber hindê jî tirseke mezin ya navcûnê ketiye dilê karbidestên Komara Îslamiya Îranê. Bo wê hindê ku xelkê serhilday bitirsînin bi lez dest dane girtin, kuştin û wê dawiyê da jî mehkeme kirina bi lez û darwekirina xelkê da ku bitirsînin dest li meş û narazî bûnê bikişînin.

Lê, heta niha jî rêjîm nekariye bi girtin, kuştin û darwekirinê bigîje armanca xwe û xelkê bitirsîne yan jî bêdeng bike. Bi baweriya min hikûmeta Komara Îslamiya Îranê dikare xelkê bêberavan û sivîl bigre, bikuje yan jî îdam bike, lê belê qet nikare wek 43 ê salên pêş niha de xelkê teslîm û kontirol bike. Xelk êdî jiyaneke xweştir, azad û serbest dixweze û êdî tehemola jiyana bin sîbera ebayê reş û dîktatoriyê nemaye. Eger

»»»Dom R:5

»»»Doma R:4

îro yan jî wê carê nebe, bêşik yê demeke ne gelek dirêj de yê wê hikûmeta kevneperest hiloşînin. Eger xelkê qehremanê Kurdistan û Îranê li kuştin û girtinê bitirsîba, dibî piştî 43ê salan qet basa azadî û serbestiyê nekiriba. Lê, kesên dîktator û nezan wê yekê fam nakin.

**P: kek Silêman Keleşî, Amerîka û hin kesayetiyên siyasî û çalakvanên siyasî yên welatên derve ji civaka cîhanî daxwaza derxistina Komara Îslamiya Îranê li Komîsyona Pêgeha Jinan ya navneteweyî de dikin eger ev daxwazkarî cî bi cî be hûn çava dinrxînin?**

**B:** Belêm bi dilxweşîye we ev daxwaza Amrîka û van kesayetiyan hat cî û Komara Îslamiya Îranê li komîsyona Pêgeha Jinan ya Navneteweyî de hate derxistin. Ewa jî serkeftinek mezin û pêngaveke pir baş û girîng bû bo xelkê Îranê bi giştî û bo Jinan bi xasmaî. Ev yeka nîşan dide ku xelkê cîhanê û rêkxistinên navneteweyî jî piştgîriya şoreş û berxwedana xelkê Îran û Kurdistanê dikin ku bi navê Jîna Emînî li Dinyayê da hatiye nas kirin. Ev biryara han nîşan dide ku civaka Cîhanî û Navneteweyî roj bi roj li Komara Îslamî dûr dikeve û li şoreş û berxwedana xelkê nêzîk dibe.

**P: kek Silêman Keleşî seredan Şî serkomarê Çînê bo Erebistanê çi peyamek bo Îranê heye?**

**B:** Rastî seredana Şî Çî serkomarê Çînê li demeke wisa de bo Erebistanê dikare peyameke nexweş be bo Îranê, ber hind karbidestên paye billind ên Îranê hemêşe sê welatên : Amerîka, Îsraîl û Erebistanê wek dijmin û têkderê Îranê dizanin. Her wek serokkomarê van Reîsî jî bas kir û got ewa xeberek nexweş bû bo me. Îran bi van pêwendî û pêmanên okonomî ku digel welatê Çînê hebûn, çi dema bawer nedikirin ku karbidestên Çînê li demeke wisa de seredana Erebistanê bikin.

Rêber û karbidestên Îranê siyasetê jî her wek nimêjê negur dizanin, wisa difikirin ku Çîn û Rûsiyê çi digel van qise kiriye yan jî peyman girêdaye heta dawiyê û Cehnem û Bihiştê yê digel van be.

Nizanin siyaset berjewendiye û çi caran dost û dijminê heta hetayî li siyasetê da nine. Çîn û Rûsiyayê pişta gelek dewletên wek Îranê erdê dane û yê Îranê jî erdê

# Yeldaya serhildan û hêvîdariyê



N: Selîm Zencîrî Berpirsê Navenda Hilbijartina PDKÎ

Yelda ku tê wateya rojbûn yan jidaykbûnê, piştqahîm e bi felsefe û dîrokek dirêj li nav gelên deverê û bi taybetî Kurdan.

Roj ku dema kar, kesabet, cotkarî û çandiniyê bû, bi avaker û pîroz dihat dîtin, lê şev ku tejî bû ji bêdengî û tarîtî û herweha talan, dizîn û kuştinan, weke nehs û biyom dihat meyzandin. Şeva Yelda jî ku dirêjtirîn şeva salê ye, xelk neçar dima bona verevandina nehsî û xweparastin ji bela û felaketan şiyar bimînin û bi hilkirina agir û ronahîkirina malan, bi ser tarîtiyê de serbikevin.

Bi derbasbûna demê, Yeldayê rengek siyasî jî bi xwe girtî ye. Wate di felsefeya siyasî ya gelên Îranê de, hêza serdest û dîktatoriya îslamî, temsîl û nûneratiya tarîtî, cinayet, zulm û felaketan dike.

Herweha xebat û tekoşîna gelên bindest ji bo maf û azadiyê jî, girêdayî hêzên roj û dilovaniyê dikin ku li dijî mirîhizrên tarîtiyê ye û bi derketina rojê û serkevtina ronahiyê, jiyan jî asayî dibe.

Kurd û gelên din yên Îranê îsal di rewş û kavdanekê de ber bi pêşwaziya şeva Yeldayê ve diçin ku tarîtiya şeva tarîhizran, bi awayek rijd şerê derketina ronahî û roja azadiyê dike.

Şer û berbirûbûna du hizrên dijîhev ku çarenivîsa Îran û deverê diyarî dike. Lê cewhera hizra ku di dilê yeldaya me de veşartî maye, niha pitir ji her demekê xwe dide eyanê û mizgîniya serkevtinê dide.

Pêşiyên me li xwe re negotine ku ''Her tiştek li ziraviyê de diqete, lê mirov di stûriyê de''.
Li ser vê bingehê jî, zulm, cinayet û hovêtiyên rejîma terorîstî a Îranê jî ewqas zêde û berfireh bûne ku êdî sebra xelkê ji dest derketiye û dixwazin vê zordariyê ji reh û rîşal ve hişik bikin. Jiber ku li gor felsefeya sirûştê be jî, her tarîtî û bêdadiyek li dawiyê de li hember dilvovanî û germahiya rojê ku gewhera hertim herman a çanda me ye, şikestê dixwe.

Yelda cuda ji sermiyan û mîrata kultorî, girîngî û buhayek menewî jî bo me kurdan heye, jiberku şeva jidayîkbûna rêberê şehîd, Dr. Ebdulrehman Qasimlo ye.

Rêberê ku peyamhînerê aştî, azadî û wekheviyê bû.

Têgeh û nirxên ku piştî sê dehsalan bi ser terorkirina wî re, îrorojê xwe di durûşma ''Jin, jiyan, azadî'' de nîşan dide û tevî derbaskirina sînorên Kurdistan û Îranê, cîhanî dibe.

Rêberek ku di rêbaza xwe de zîndî ye û wane û şîretên wî bûne bi çirayê ronahîdere riya rêvîngan û dengvedana siloganên ''Qasimlo Qasimlo riya te dirêjî heye'' li şeqam û kolanên Rojhilta Kurdistanê de, guhê dujmin kerr û koşka dîktatoriyê jî dihejîne. Lewma niha riha rêberê şehîd pitir ji her demekê aram û şad e ku navê wî bûye bi remza xebatê, wane û şîretên wî bûne bi sermeşqa jiyanê, û raman û rêbaza wî jî bûye bi rêbaza milyon kurdan. Niha riha yeldayî a Dr. Qasimlo şad e ku dibîne keç û law û welatparêzên niştimana wî weha bi coş û hemas ve meşxel û şemalka xebat û serhildana li jêr navê Jînayê de bi qîrandina durûşma ''Qasimlo Qasimlo riya te dirêjî heye'' didomîn in.

Serhildanek bêhempa ku serbarê hemû hovîtiyên rejîma terorîstî a Îranê derbasî meha çaremîn a xwe bûye û roj bi rojê xurttir û têhn û germahiya agirê wê jî gurtir û peşqelên wê jî ronahîtir dibin û hêvî û moralek mezin dide serhildêran bo serketinê.

Hêviyek bi tam û felsefeya Yeldaya serhildanê, Yeldaya hêvîdarî, geşbînî û ronahiyê.

Yeldaya hêviyên pengurî di dilê dayîkên kezebşevitî bo tolhildanê, û Yeldaya nûkirina peymanê bi şehîd Qasimlo û hemû şehîdên doza maf û azadiyê re. Yeldaya ku berejanên jidayîkbûna roja azadî û dadvaniyê li xwe de cih daye.

Azadiya ku bi salan e zewtkirî ye û bûye xewn û hêviya azadîxwazan.

Azadiya ku tirs û wehşetek mezin xistiye dilê şevperest û tarîperestan. Daxwaziyek rewa ku xala hevpare hevpêwendî, yekîtî û hevxebatiya gelan e. Lewre hewce ye bi felsefe û ramana Yeldaya serhildan û hêvîdariyê ve em ber bi pêş ve biçin û nehêlin dirêjî, zulm û xofa şeva tarîperestan bandorê li morala hêvîdariya me û şervanên roj û ronahiyê bike.

Tenê bi şiyarmanê, gurttirkirina agirê xebatê, hevxebatî û yekîtiyê, û bi berdewamiya hizûra li şeqam û kolanan de ye ku emê bibin şahidê dawîhatina şeva bêdadiyê û hilatina tîrojkên roja azadiyê bo esmanê welatê xwe, ku ew roj, ne dûr e.

# Hêza yekîtiyê



N: Hesen Mukerem



Yekîtî û hevdengiya xwenîşanderan li hember hêzên serkutkar yên rejîma dîktator ya Xamineyî de weke kabûsê psîra wan girtiye û ber nade, û roj li peyê rojê ev kabûs bi xwenîşandan û siloganên weke "Jin, Jiyan, Azadî" û amadebûna jinê digel mêran li ser şeqaman hêmbêza dijmin bi agir dişewitîne û dijmin ber berdaye canê yektir, bo mînak me dît ku piştî eşkerebûna hêzî û bêexlaqiya Qasim Rostemî Wezîrê berê yê veguhastin û geşepêdana metropolan yê rejîmê û gefxwarina wî ji berpirsên din bona eşkerekirina gendeliyên wan, ev di bêdengiyê de kuştin û piştire di medyayên xwe de gotin ku ji ber nesaxiyê miriye.

Ev kabûs û agirê xwenîşanderan wirda di nav dilê dijmin de bidawî nabe, piştî birêve çûna gireva seranserî li bajarên Rojhilatê Kurdistan û Îranê, rejîma xwînmij, xort û jinên daxwazkarê mafên rewa yên azadî û jiyana xwe ku serhildan e, li ser şeqaman û li zindanan bi dirindanetirîn şêwazî wan komkuj dike ku, yek ji wan Muhsên Şikarî ji binçavkiriyên xwenîşandanên serhildana seranserî bû ku tenê heyama du mehan bi sûça astengkirina rê û birîndarkirina besîcekî rejîmê di hepsê de bû, lê, çavsorî û serberedaya dîktatorên serdemê nekarî vê hêz û îradeya wî şoreşgerî bibînin û demldest û di dadgehek nimayşî û nedadperwerane de sizaya îdamê bi ser de sepandin û ev îdam kirin, ev tawana rejîmê di halekê de ye ku, Se`îd Mortezewî ku di sala 2002`an de ku serdozgerê giştî yê Tehranê bû û li bûyera girtîgeha Kehrîzekê de bêdadî nema ku di serê girtiyan de neanî, heta Zehra Kazimî wênegira jin ku tenê ji malbatên girtiyan yên ku ber deriyê girtîgehê bona agehdarbûn ji qedera mirovên xwe yên li girtîgehê kom bibûn bi vê sûçê binçavkir û di girtîhehê de îşkence kirin û di bin êşkenceyê de derve li serê wê dan û tûşî xwînrêjiya mejî bû û çend demjmêran piştî xwînrêjiya mejî canê xwe jidest da, ev tenê mînakeke, û rejîmê Se`îd Motezewiyê cinayetkar jî, tenê cihê wî guhert û ev kirin bi Bepirsê Saziya Dabînkirina Civaka dewletê.

Komara Îslamî wisa zanî wiha dikarin li hember xezeb û kerb û kîna xelkê serhildêr de berxwedanî bike û dê bikarin dengê wan bifetisînin, bi xwaşî ve xelk bi hêz û yekgirtiyek tewav û îradeyek polayîn li çeperên şeqaman de amade ne û rejîm çimes kirine.
Gireva sê rojan ya seranserî ya bajarên Rojhilatê Kurdistan û Îranê ku hemû gelên Îranê bi hev re û yekdeng li ser pêya bûn, li hember ewrên reş û tarî yên dîrokê ku celad û xwînmjên Komara Îslamî ne û ev heyama 40 û çend salan e, ji ber nebûna piresîpên demokrasiyê û hakim bûna desthildariya dîktatoriyê, siya vê esmanê xelkê zilmlêkirî tarî kiriye, şevqa yekîtî û yekdengiya wan li seranserê cîhanê veda.
Komara Îslamî nekarî li hember vê hêza yekgirtî û hevdeng de xweragiriyê bike û dest havêtiye bi bidarvekirina bidizî ya ciwanên serhildayî.

Komara Îslamî wisa bi bidarvekirina ciwanên welat pê de diçe, mirov wisa dizane ku ev mirov nin an heta canliber jî nin û di vê cîhanê de ti mafek bo jiyanê tunîn, mîna Fire`vin hemû hewlên xwe bona tunekirina netewyên Kurd û Belûç dide, bi komkujî, bidarvekirin û îşkencekirinê ji ber ku esasê tunekirina miletan e.

Gelên Îranê bi yekîtî û yekdengî û bi awayê sivîl an medenî bi hemû qaweta xwe li hember hêzên cinayekar yên rejîmê ku bi çekên giran hatine meydanê rawestane, lê, mixabin rejîma byûn ti komkujî û qirkirinek nemaye ku di serê xelkê serhildayî de neîne, lê, gelên serhildayî bi îradeya polayîn û yekdengî her ku diçe zêdetir û bi qawetir ser şeqaman in û siloganên herfîna dîktatoriyê diqîrin.
Demaku şehîdbûna ewqas ciwanên bê sûç dibînî ku tenê daxwazkarê mafê azadî û jiyanê ne, dilê mirov pirr dêşe, lê, gel bi wan komkujî û bêdadiyan pêngavan paşve nahavêje.


Komara Îslamî ku di sala 1979`an de ku Şa desthilatdar bû û hikûmetek paşayî bû ne ayînî, biqasî niha ciwanên welat qir nekir, biqasî niha komkujî pêk neanî. Mixabin Komara Îslamî li ser navê ayîn hemû kiriyarek bêexlaqî û dûr ji mirovahiyê birêve dibe.

Lê, bi îrade, yekdengî û hevgirtîbûna gelên Îranê, paşeroja wan rohn e, bûyerên ku niha di Rojhilatê Kurdistan û Îranê de diqewmin û pêvajoya xwenîşandanên seranserî ku her ku pêde diçe zêdetir li berê qawetê digire, mirov dikare bêje ku, ev îrade û yekîtiya di navbera xwenîşanderên seranserê Îranê de, dê dawiyê bi desthilata dîktatorê serdemê yanî Xomeynî û Xamineyî bîne, çiroskên azadiyê, çiroskên serkevtin û paşeroj rohn diyar in.

**Serbikeve şoreşa seransrî ya gelên Îranê.**

**Neman û herfîn bo Komara îdamê.**

## Nerîna Lîderan



**“Vladimir Pûtîn:”**

Li herêmên girêdayî Ûkraynayê em bi şert û mercên gelekî dijwar re rû bi rû ne



**“Adil Cubeyrî”:**

Pirsgirêkên herêmê di sala 1979an de destpêkirin




**“Bob Menendez,”:**

Ez firotina F16an bo Tirkiyê pesend nakim!



“ Ehemed Xatemî:”:

Tûrban ne tenê çend metre qumaş e

# Îran bûye rojeva navçeyê; hemû welat karvedanê nîşan didin



**N: Eskender Ceiferî**

Rejîma faşîstên Tehranê di şehîdkirina serhildêran de berdewam e û di asta navdewletî de jî karvedanên zêdetir çê dibin.
Rejîm herwisa givaşê dike ser kompaniyên Înternetê jî da ku zanyariyên welatiyan bidin rejîmê.
Çapemeniya Îranê ragihand ku muhleta ku rayedarên Tehranê dabûn Meta ji bo girtina Instagram û WhatsAppê îro bi dawî bû.
Li gorî berpirsên Îranê, eger ew kompanî bersiva daxwazên Îranê nede, Instagram û WhatsApp dê li Îranê bi awayekî daîmî bên girtin.
Navenda Înternetê ya Netewî du name ji Meta re şand.
Ebul Hesen Fairouzabadî serokê vê navenda rejîmê got, eger Meta bersiv nede, dadweriya Îranê dê platformên daîmî bigre.
Herwiha Ebdulhesen Fairouzabadî diyar kir ku ji bo berdewamkirina van platforman lîsansa qanûnî hewce dike.
Çend rojan beriya niha jî Ehmed Wehîdî Wezîrê Navxwe yê rejîma Îranê gotibû ew hewl didin da ku cîhana hîpotetîk bi awayekî daîmî rawestînin.
Di van salên dawî de, rejîma Îranê çend torên civakî ji wan Facebook û Twitterê fîltêr kirine û tometbarê aloziyên wî welatî kirine.
Hewlên rejîmê ji bo astengkirina Internetê, tenê ji bo bidawîanînaserhildanê ne.
Tevî wê, rejîma Tehranê hewl dide navçeyê aloz bike da ku bala cîhanê li ser serhildanê nemîne.
Emmanuel Macron serokomarê Fransayê bi awayekî nerasterast, Îran bi derxistina aloziyê li Iraq û navçeyê tometbar kir. Emîr Husên Ebdullahiyan wezîrê Derve yê rejîma Îranê jî heman tomet arasteyî Serokomarê Fransayê kir û bi awayekî nerasterast bersiva hevdû dan.
Emmanuel Macron û Emîr Husên Ebdullahiyan li hola civînê ya Konferansa Lûtkeya Bexdayê ku li welatê Urdinê birêve diçe, amade bûn û gotarên xwe pêşkêş kirin.
Macron di destpêka konfeansê de ligel balkişandina ser asayîşa navçeyê û bi taybetî ya Iraqê, ragihand: “Aliyên ku li Yemen û Lubnanê bûne sedema kêşeyan, heman siyasetê li Iraq û navçeyê peyrew dikin.”
Wî herwisa di axaftina xwe de parastina serweriya Iraqê dubare kir û daxwaza bidawîanîna destwerdana karûbarên navxweyî yên Iraqê kir.
Emîr Husên Ebdullahiyan jî di konferansê de li hember axaftinên Serokomarê Fransayê diyar kir: “Nabe li axa welatên me yên dost û bira, gef li ti welatekî were xwarin, em di wê baweriyê de ne ku kêşeyên navçeyê tenê bi rêya gotûbêja navbera welatan têne çareserkirin.”
Emîr Husên Ebdullahiyan di axaftina xwe de bi awayekî nerasterast bersiv da gotinên Emmanuel Macron ên li ser parastina asayîş û serweriya Iraqê û got: “Mijara asayîşê bi hemû welatan ve girêdayî ye, nabe hemû hewldan ji bo neseqamgîrkirina welatekî were dayîn û li aliyê din hewl ji bo seqamgîriya welatekî din were dayîn.”
Rejîma Tehranê tenê li vir, lê di nijara Ukraynê de jî hîn her rojev e.
Rishi Sunak serokwezîrê Brîtanya ragihand ku divê Îran şandina çekan ji Rûsyayê re li Neteweyên Yekbûyî rawestîne.
Sunak ragihand ku ewê doza alîkariya leşkerî ya Îranê bigihînin Neteweyên Yekbûyî û rê li hinartina balafirên bêpîlot û çekên Îranê bo Rûsyayê bigirin.
Serokwezîrê Brîtanya di civîna sêyemîn de got: “Daxwaza Rûsyayê ya yekalî ya agirbestê xelet e û armanca wê ew e ku hêzên xwe ji nû ve birêxistin bike. Divê em piştrast bin ku em zêdetir alîkariyên leşkerî ji Ukraynayê re bişînin da ku hewcedariyên wê di şerê li dijî Rûsyayê de peyda bike, ango bêtir pergalên berevaniya mûşekî û bêtir çek û wesayîtên leşkerî.”
Di berdewamiyê de jî Sunak dibêje: “Alîkariya me ya ji bo Ukraynayê îsal û sala bê derketiye 2,8 milyar dolarî.
Daxwaza Rûsyayê ya yekalî ya agirbestê xelet e û armanca Rûsyayê ji nû ve birêxistinkirin û komkirina hêzên xwe ye.
Herwiha Sunak got: “Divê em çavê xwe li kêmkirina şiyanên leşkerî yên Rûsyayê bidin û rê li ber seferberiya Rûsyayê bigirin û nehêlin alîkariyên navdewletî bigihin Rûsyayê, nemaze ez li ser çekên ku Îran dide Rûsyayê difikirim.”
Ev jî di demekê de ye ku Îsraîl hewl dide gefên rejîmê li Rojhilata Navîn kontrol bike.

Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan ragihand, 2 çekdarên ji komên alîgirên Tehran û Hizbullaha Libnanî di mûşekbarana Îsraîlî li ser li derdora Şamê de hatine kuştin.
Ajansa “SANA” a Sûriyê ji zarê jêderekî leşkerî ragihand, Israîlê bi mûşekan êrîşeke asmanî pêk anî ku di encama êrîşan de 2 leşker birîndar bûn û hin ziyanên madî derketine.
Wî jêderî got jî: “Sîstema me ya berevaniya asmanî rûbirûyî mûşekan bû û hejmarek ji wan xistin xwarê.”
Li gorî Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan, mûşekbaranê depoyeke çekan a Hizbullaha Libnanî, ku di navbera Firokexaneya Navdewletî ya Şamê û devera Seyida Zeyneb li başûrê Şamê de ye,kire armanc.
Rewangehê da zanîn jî, 2 kes di encama mûşekbaranê de hatine kuştin, bêyî ku nasname û regeza kesekî ji wan diyar bike.
Ev bombebaran piştî nêzîkî hefteyekê ji êrîşa Îsraîlê li firokexaneya leşkerî ya Şueyrat li navenda Sûriyê tê ku di encamê de 2 leşker hatin kuştin û 3 leşker jî birîndar bûbûn.
Rast e ku Îran dixwaze bala kesî li ser serhildanê nemîne, lê Yekîtiya Ewropayê û Îsraîl her yek ji rexekî ve mijûl in da ku gefên rejîmê bo sdr navçeyê kontrol bikin.

# Roj ji Rojhelat derdikeve



N: Ebdûlazîz Qasim



Piştî kuştina keça kurd Jîna Emînî, ya 22 salî, li ser destê polîsên rêjîma Îranê di 16ê Îlonê de, ev nêzîkî çar heyvan heye, grev û xwepêşandanên cemawerî yên girsayî wekî şoreşeke aştiyane li tevaya Îranê û welatên diniyayê li dijî rêjîma Îranê bi berdewamî roj bi roj zêdetir dibin û herwisa nerazîbûna dewletên Rojavayî li hember rêjîma Tehranê zêdetir dibe, nemaze piştî bangewaziyên cemawerî yên ji bo greveke giştî bo heyamê sê roja li seranserî Îranê ji pêncê heta heftê vê mehê bi beşdariyeke cemawerî ya berfireh ji bo piştgiriya xwepêşanderan û şermezarkirina rêjîmê, ku li hember zêdebûna bizava xwenîşanderan li Îranê, piştî bangewaziyên nû yên çalakvanan, yekser Dozgerê rêjîmê betalkirina polîsê exlaqê yê berpirs li hember kuştina Jîna Emînî ragihand, tevî ku çavdêr û çalakvanên li qada xwepêşandanan hişyariyê didin derbarê vê ragihandinê de, ku li ser erdê hêşta polîsê exlaqê nehatiye betalkirin, lê tevî wisa jî çavdêrên siyasî ragihandina dozgerê rêjîmê wekî paşketinek ji rejîmê re dibînin, û vê yekê nikarî rêjîmê rizgar bike û li roja 14'ê vê mehê, Îran ji desteya Jinan ya Neteweyên Yekbûyî hat derxistin ji ber tawan û siyasetên li dijî jinan û keçan.

Hevdem ku Komîserê Bilind yê Mafên Mirovan yê Neteweyên Yekbûyî Volker Turk got ku Îran rûbirûyê qeyraneke tewaw ya mafên mirovan dibe, ji encama "tundûtûjiya dijwar ya dewletê" li dijî xwepêşanderan di 8 hefteyên borî de, nemaze piştî bidarvekirina du xwepêşanderan "Muhsin Şakarî û Mecîd Riza" li 8 û 12 vê mehê, ku Rêxistina Lêborîna Navnetewî darvekirina Muhsin Şakarî bi "xemgîn" wesif kir, û got piştî "dadgeheke sexte ya pir bêdadî hat bidarvekirin", û dîsa got ku "darvekirina wî hovîtiya sîstema dadwerî ya Îranê aşkere dike, ku bi dehan kesên din rastî heman çarenivîsê tên", Rêxistina navbirî got ku rayedarên Îranî hewl didin ku bi kêmî ve 21 kesan bidarve bikin di wê yekê de ku ew wekî "dadgehkirinên sexte bi mebesta tirsandina xwepêşanderan".
Ji aliyeke din ve, rojane sizayên Rojavayî "Ewropî, Amerîkî, Keneda, Birêtaniya" li ser rêjîmê zêdetir dibin, hevdem ku ti pêşkeftin di dosya navokî ya Îranê de nebûye û gotûbêjên di navbera Îran û welatên Rojavayî de bê ti encamek hatin rawestandin, piştî ku Îranê pêgirî nekir li ser girtina lêkolînên Ajansa Navnetewî ya Enerjiya Atomê piştî dîtina şûwarê uraniyûma dewlemendkirî di 3 kargehên navokî yên nehînî de, ku Dîplomatekî Ewropî ji kanalên El-Erebiye û El-Hedath re got ku "ti pêwîstî nemaye bo danûstandinên Viyenê bi Îranê re, û got danûstandin "bi dawî bûn".

Derbarî destêwerdana Îranê di şerê Ukraiyna de, Serokê CIA William Burns di hevpeyvînekê de di roja Înê 16ê vê mehê de got ku Rûsya alîkariya ji Îranê distîne, ku dê bibe metirsî li ser hevalbendên Amerîka li herêmê, û li gorî tora "NBC" ku Rûsiya piştgirîya leşkerî û teknîkî dide Îranê, beramber çekên ku Tehran dide Moskowê yên li Ukraynayê têne bikaranîn, tevî firokeyên bê firokevan, û gotibû ku Tehran difikire ku mûşekên balîstîk bide Rûsyayê.

Wisa xuyaye, ku îro rêjîma Îranê rastî mezintirîn serheldana cemawerî tê her ji sala 1979'an ve, ku her li ser astê navxweyî û her li ser astê navdewletî ketiye qeyraneke mezin de, ku nikare qeyrana xwe bi aştî ne digel xelkê Îranê û nejî digel welatên Rojavayî çareser bike, lewra ber bi tuneleke reş diçe û li dijî xelkê Îranê serkutkariya xwe zêdetir dike, lewra tevî sepandina sizayan û şermezarkirina tawanên rêjîmê, lê rêxistinên mafên mirovan daxwaz ji Ewropa û Amerîka dikin, ku sizayên zêdetir bisepînin û peywendiyên dîplomatîk yên bi Îranê re biwestînin, balyoz û nûnerên wê ji paytextên Ewropayê û dezgehên navneteweyî derxînin, bang li welatên Ewropî tên kirin, ku bazirganiyê û danûstandinan bi rejîmê re rawestînin, û Pasdarên wê ku piraniya aborî li Îranê û bazirganiya derve kontrol dike, bêxin di nav lîsteya terorê de.

Lê em hemû dizanin, ku demê em behsa Îranê dikin, ku em nikarin behsa bi dehan milîs û gropên çekdar û çete û kirêgirtiyên wê li Îrak, Sûriya û Libnanê nekin, ku bandora Îranê li herêmê ne tinê ji hêza wê derdikeve, belkî di encama şert û mercên ewlehî yên navxweyî û navdewletî û guhertinên Iraq, Lubnan û Sûriye tê re derbas bûn, ku ji aliyê rêjîma Îranê komên çekdar li herêmê bicih dikir, bi îstismarkirina valahiya ewlekarî û îdarî li van welatan, û ji bo avakirina qebarên ewlekarî û aborî ku rasterast bi serkirdeyên payebilind ya bi hêza Pasdaran ve girêdayî.

Lewra her guhertinek li Îranê, dê bandora xwe ya erênî li tevaya herêmê hebe, û di nav de pirsa kurdî jî ne tinê li Rojhelatê Kurdistanê, herwisa dê bargiraniya li ser Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji aliyê Bexdayê sivik bibe, ku dê "Hişda Şe'ebî" lawaz bibe, herwisa heta wê bandora wê hebe li ser rewşa Rojavayê Kurdistanê û rêkeftina aliyên siyasî yên Kurdên Rojava li ser pirsa xwe ya neteweyî di demeke nêzîk de hebe.

# Ev xala ku meceyeta vê xema zilam e



N: Vênûs Fayîq
W: Hesen Mukerem



Nizanim dilxweş bim an dilteng, demekê ku gotara nivîskareke zilaman dibînim ku ji maf û azadiyên jinan berevanî dike.

Bi vê yekê dilxweş dibim û ji minê çewsandî ya jin li ser destê zilamekê berevanî dike?

An dilteng bim ku di gotar û civîn û korr û semîran de bi dengê bilind ji minê maf jê xwarî û bindestê zilamekê berevanî dike? Axer dema ku gotara zilamekî dibînim dixwazim jinên nav malbata wî de jî nas bikim, ev ji min ra dibêjin rast dibêje an na?

Ez wisa hizr dikim ku mala hinek "dibêjim hinek" ji wan zilaman ewqas paqij e ku, denka toz û xalî li ser ti tiştekê nayê dîtin, di van malan de jineka kabaniya xwe bo mal û zarok û hevjînê xwe dest nîşan kiriye, bo demeke wisa li destê wê de nemaye da ku pirtûkekê bixwîne!

Hêviyek wisa nemaye ku, bicebîne ji ber birêvebirina erk û karên di nav malê de.

Zilamên wiha bi bê arîşe û girft in, odeyek taybet bixwe hene ku hundr bi aramî hizr li axavtinên tund dikin û berhev dikin.

Ji warê te`iorî ve, bi gengeşekirinê nagihîjiyê.

Gelo eger li derheq jiyana taybet ya wan digel wan biaxivî, tenê arîşeya wan eve ku hevjînên wan bilî amadekirina xwarinê, zayîna zarokan û xwedîkirinê, ti hêviyek din a wan tune ye.

Zilamên wiha dibêjin: "Dunaya min cuda ye", îhsas dike zilmek gelek zêde jê hatiye kirin û kêrhatiyê jinekê ye ku, li hevjîna vê baştir e, an kêrhatiyê azadiyekê ye ku jin û zarok di nav de nebin. Helbet, heman ev hizr û ramana bo hinek li hunermendan jî rast e.
Yekem car ku nivîsa zilamekî nivîskar li derheq jinê dixwînim dilgeş dibim, çimkî digel gelek zilamên wiha nerazîbûna min hedibe, ev bîrdoziya hizrkirinê ji ber teşegirtinê ye,

Ji ber ku ez dikevim xefika dubendiya zilamekî bi cil û bergên bedev û nivîsên ciwan, û di praktîkê de rastî heqîqeteke din dibim û neçar dibim hizrek cuda bikim.

Di heqîqetê de, bîrdoziya wan zilaman di xala hêzê de tund dibe û li dewra vê dizvir e, ev xala desthilat û merceyeta vê amade nine di bin ti hinceteké de dev jê ber de.

Ya ku dibe hemû biryar ji vê çavkaniyê vegire û jin weke perperokekê li dewra vî devr lêbide û wan cî bi cî bike û mifahê jê werbigre, û hêz û rohnahiya kesayetî di hêz û rohnahiya kesayetiya zilamekî wergire, nek ev bixwe vê drust bike.

Îca ya ecêb di vê de ye ku hinek zilamên nivîskar baweriyan wisa ye ku, beşdariya jinê di lîstika siyasetan de dawiyê bi belengaziyan tîne ku, ev daxwazkariyeka tewav a jinên çalakvan û fîmînîst e jî, kiçî bi baweriya min, jin di lîstika siyasetan de kurt hizre di zencîreya daxwazkariyên jinê de.

Ji ber ku ev jinên ku gihîştine bi post û pleyên siyasî li Rojhilata paremayî de, niha jî digel wan bibî li destê alozî û tengasiya civaka paremayî rizgar nebûne. Hîn zilamek di jiyana wê de maye ku, bi tevahî berevajî hizr dike û baweriya tewav bi mirovahiya jinê nine.

Me hîn civaka xwe paqij nekriye kiçî baz didin û ji îdeolojiya Rojavayê pêşwazî dikin û axavtinên mezin di gotaran de bikar tînin. Me dîroka Rojavaya nexwandiye, ji ber ku gihîştine bi qonaxekê ku ev jî heqîqeta niha ye ku hundr de dijîn, em ji vê yekê tênegihîtine ku Rojava bixwe çav li ti neteweyek din nekiriye, belkû, bixwe hemû belengazî û nexweşî ezmûn kirine û di encamê de biryara tekoşîn û serhildanê daye û binyatên jiyana bikramet bo mirov û bo jinê raçandiye.

Êdî fêm dikin ku "temaşeker"nebin û bi xebatê pênase bikin, belkû, dibe em bibin xwediyê xeyal û cîhanbînî û pirensîpên xwe di xebata tekoşîna xwe de bi armanca jiyaneke kêrhatiyê mirovahiyê, û jin û zilam tê de wekhev bin.

Me hewcehî bi nivîskarên drevker tune ye, me hewcehî bi kedkareke civakî heye ku di nav mala xwe de destpê bike û vê paqij bike da ku, ev civak paqij bibe, ji ber ku gihîştine bi dawîn pêngavê ku beşdariya siyasî ya jinên kêrhatî da ku post û pleyan tijî bikin, neku jinên wisa ku bo ciwankirina partiyê bo xeta herî pêş ve dibin, çavê wan li zêdebûna heqdestê ye ku serê mehê didin destê zilamê xwe, û dawîn car bi gotara hinek nivîskarên direvker yên zilam geş dibin.

# Hunermend Dilo Doxan: “Ez jî hunermendê vê netewê me û bi êşa gelê xwe dêşim û xemgîn dibim û her wiha di serkeftinan de jî kêfxweş dibim û dîsan bi erkê xwe radibim”.



Hunemend: Dilo Doxan

**Me digel hunermendê Kurd Dilo Doxan li derheq terxankirina perê konsertê bo penaberên Rojhilatê Kurdistanê yên li Herêma Kurdistanê hevpeyvîn pêk anî navbirî got: “Ez jî hunermendê vê netewê me û bi êşa gelê xwe dêşim û xemgîn dibim û her wiha di serkeftinan de jî kêfxweş dibim û dîsan bi erkê xwe radibim”.**

**P: Rêzdar Dilovan di destpê de ji kerema xwe, xwe ji xwandevanên rojnameya Agirî re bidin naskirin?**

B: Di serî de Silav bo hemî xwendevanên Rojnameya Agirî re

Wek we anî ziman navê min Dilovan e û bi navê Dilo Doxan di **warê** hunerê de têm naskirin .

Di 1984`an de li bajarokê Tirbespiyê ku girêdayî Rojavayê Kurdistanê ye jidayik bûme .

Di malbatek kurdperwer û kurd hez de mezin bûme û her wiha malbatek tijî huner e û bandorek mezin li kesayeta min kir.

Xwendina xwe heyanî lîsayê li welat kir û di 2009 ve heya niha li welatê Almaniya yê jiyan dikim .

Û ev demek dirêje ku di warê hunerê de xebatê dikim her wiha min hijmarek baş ji berheman heye wek Albom û Singel her wiha û ez hîn di karê xwe de berdewam im .

**P: Rêzdar Dilovan ji kerema xwe ji xwandevanên rojnameya Agirî dikarin bêjin çawa bû ku we biryara lidarxistina vê konsertê stand?**

B: Rastî gava ku min biriyar da vê gavê bidim mixabin hinekî dem teng bû ji bo amadkariyê ji aliyê mûzîkê ve û her wiha di milê organîzê de lê gor derfetên me, me hewl da ku karek baş bikin û min têkiliya hevalên xwe yên mûzîkjen kir û me xwe amade kir ji bo li darxistina vê konsertê .



**P: Dilo Doxan çawa bo we hizr ji wê helwesta mirov dostiyê kir?**

B: Ev ne cara yekeme ku ez bi vî erkî radibim û beşdar bûm e di gelek ahengên bo alîkariya gelê me ji her çar parçeyên Kurdistanê .

Helbet bi destpêkirina şoreşa Rojhilatê Kurdistanê ku deng da û sînor derbaskirin dujminê me jî bi kiriyarên xerab û hovana li hemberî xwepêşandanan kir û hûn dizanin kampa Koye jî sê caran hate mûşekbaran kirin û bi çendan mirov jiyana xwe ji dest dan û bûn şehîdên Kurdistanê . Mixabin ji sedema mûşekbaranê gelek zirar hat kampê û xelkên li kampê û hestek pir nexweş e ku ev bixwe jî penaber in.

Wek erkekî mirovî min dît ku gerek ez bibim alîkar.

Rastî ev erkê her mirovekî xwedî wijdan e û bi taybet mirovên Kurd û ez hunermendê vê netewê me û bi êşa gelê xwe dêşim û xemgîn dibim û her wiha di serkeftinan de jî kêfxweş dibim û dîsan bi erkê xwe radibim .
Û her mirovekî navdar dikare xwedî bandor be di civaka xwe de .

**P: Gelo dema we biryar standin ku wekî hunermendî biryarek wiha mirov dostî encam bidin çi îhsasek di nav hevalan de çê bû?**

B: Helbet bo min û hevalên min hemiyan jî cihê kêfxweşiyê bû karekî wisa ku mirov karibe alîkar be bi gelê xwe re û em karibin hezkirinê di nav xwe de xurtir bikin û ez wekî Kurdê Kurdistanê xwe dibînim.

Raste ez ji Rojavayê Kurdistanê me, lê, dilê min ji bo her çar parçeyê Kurdistanê lê dide .

**P: Gelo ev kar bi alîkariya çend kesan û çawa gihîşt bi qonaxa cî bi cî kirinê?**

B: Di vî karî de têkiliya min bi heval Kanî Cihangirî re hebû ku, ew jî wek kesek zêde çalak bû di sosyal medyayê de û bi taybet di vê dema şoreşa Rojhilatê Kurdistanê de û bû alîkar bo organîzekirina vê konsêrtê.

Her wiha birayê min Deysem Doxan ku derhênerekî navdar e, tev grûpa xwe bûn alîkar û çend hevalên min mîna Heval Akîl û Beyan Hesen û sipasî ji dil bo hemiyan .

**P: Rêzdar Dilo Doxan dawî gotina we wekî hunermedî Kurd bo hunermendan çiye?**

B: Ez hêvîdar im ku ev gav berdewam bin û her mirovek bi erkê xwe yê niştîmanî li diyasporan rabe û bibin dengê welatê xwe di van rewşên wiha de gerek em yek deng bin, yek dest bin û yek helwest bin, çi mirovên Hunermend bin çi jî Rewşenbîr û her wiha siyasiyên me .

**Spas bo we**

**Silav û hezkirin bo hemî xwendevanên Rojnameya Agirî .**

# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Kirmaşan: 86 welatiyên Kurd ji aliyê hêzên ewlehî yên Spaha Pasdarana ve hatine binçavkirin

Çavkaniyek agehdar ji Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa"yê re ragihanbdiye: Di meşa bêdengî ya xelkê Kirmaşanê de, ku êvareya roja 18`ê Sermaweza 1401`an Rojî, li Taqevsanê destpê kir, tenê hêzên ewlehî û serkutkar yên Spaha Pasdaran, 86 xwenîşander binçav kirin.

Herwisa vê çavkaniya agehdar zêde kiriye ku, Ev amar tenê, wan kesan ji xwe digire ku ji aliyê hêzên Spaha Pasdarana ve hatine binçavkirin û zelal nine ku hêzên din bitaybet hêzên întizamî çiqas xwenîşander yên xelkê Kirmaşanê binîçav kirine.

Êvareya roja Înê, rêkevta 18`ê Sermaweza 1401`an a Rojî, biryar bû ku xelkê Kirmaşanê bi birêvekirina "rêpêvanek bêdeng" li Bilwara Taqewsan heta sêrêya Meskenê, tevlî gireva seranserî bibin ku, lê, ev rêpêwana xelkê û aştîxwazane jî, bi destverdana hêzên ewlehî yên serkutkaran tundûtîjî li pey xwe anî.

## Li girtîgeha Qezivînê girtiyek hat îdamkirin

Roja Pêncşemî 24`ê Sermaweza 1401`ana Rojî,(15`ê Kanûna Pêşîna 2022`an), girtiyê bi navê "Yûsif Mîrzabêygî", kurê Elî û xelkê bajarê Qesra Şîrîn li girtîgeha Qezivînê hat îdamkirin.

Pêka gotina çakaniya agehdar, "Yûsif Mîrzabêygî" berê bi tohmeta qetla hevjîna xwe hatibû binçavkirin û ji aliyê dadgeha cezayê bi îdamê hatibû mehkûmkirin.

Heta niha nûçeya bidarvekirina vî girtiyî, ji aliyê medyayên Îranê û çavkaniyên fermî ve nehatiye ragihandin.

## Şino; Du welatiyên Kurd bona birêvebirina cezayê xwe bo girtîgehê hatine veguhastin

Roja Şemî 19ê Sermaweza 1401an, du welatiyên Kurd yên bi navên "Hîwa Mîrzayî" û "Zahir Muradî" yên xelkê gundê Bêmzûrtê yê ser bi bajarê Şinoyê bona birêvebirina cezayên ku bi ser wan de hatî sepandin, bo girtîgeha wî bajarî hatine veguhastin.

Herwisa ev herdu welatiyên Kurd ji aliyê dadgeha Şoreş a bajarê Şinoyê ve bi tohmeta "alîkarîkirin digel yek ji partiyên Kurdî yên dijberên hikûmeta Îranê", her yek bi yek sal hepsa te`izîrî hatibûn cezakirin.

Roja Pêncşemî 17ê Xermananê, ev du welatiyên Kurd bi danîna barimteyê ji girtîgeha wî bajarî hatibûn azadkirin.

Her di vê pêwendiyê de, roja Çarşemî 9ê Xermananê, ev herdu welatiyên Kurd bi dawhatina lêkolînan wan, li yek ji girtîgehên ewlehî yên bajarê Urmiyê de bo girtîgeha Şinoyê hatibûn veguhastin.

Herwisa ev du welatiyên xelkê bajarê Şinoyê, di heyama binçavkirinê de ji mafê destpêragihîştin bi parêzer û hevdîtin digel malbatên xwe hatibûn bêparkirin.

Roja Yekşemî 23ê Gelawêjê, ev du welatî bi bê hebûna ti belgeyeke yasayî ji aliyê hêzên ewlehî yên hikûmetê ve hatibûne binçavkirin û bo lêkolînkirinê bo yek ji girtîgehên ewlehî yên bajarê Urmiyê hatibûn veguhastin

## Ciwanro: Mamoste Sêyfola Husêynî ji aliyê hêzên ewlehî ve hat binçavkirin

Mamoste Sêyfola Husêynî, pêşnimêjê mizgefta Xatem El_Embiya ya bajarê Ciwanroyê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hat binçavkirin û ti zanyariyek li derheq qedera wî ber dest tune ye.

Serêspêdeya roja Sêşemî 22`ê Sermaweza 1401`an a Rojî, hêzên ewlehî êrîşî ser mala wî mamosteyê olî kirin û bi tundûtîjî ev binçav kirine.

Pêka gotina çavkaniyek agehdar, hêzên ewlehî, dema êrîşkirina ser mala mamoste Sêyfola Husêynî destê Xatûn Qadirî hevjîna wî mamosteyê olî şikandine û demldest ev bo nexweşxaneyê veguhastine.

Herwisa vê çavkaniyê zêde jî kiriye ku: Ev mamosteyê olî piştî binçavkirinê bo girtîgeha Spahê ya Nebî Ekrem a bajarê Kirmaşanê veguhastin e.

Her li derheq binçavkirina mamoste Sêyfola Husêynî, xelkê Ciwanroyê li hember fermandariya wî bajarî kombûn û daxwaza azadkirina demldest a wî kirine.

Mamoste Sêyfola Husêyênî endamê Mekteba Qora`ana Kurdistanê ye

# Agirî


- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (436)